# Gelo Rojhilata Navîn avisê bûyerên nû ye?

»»» R:4



# Rêjîma Îranê ewlehiya Rojhilata Navîn têk daye

»»» R:3

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

www.agirimedia.org Hejmar (461) 06-01-2024 Buha (1000) Tûmen

# Bila em mohra Kurdî li tundûtîjiyên li ser jinê nedin

»»» R:5

# Tirkiye û siyaseta qirkirina Gelê kurd

»»» R:8

## XWÎNMIJEK KU PIŞTÎ NEMANA XWE JÎ HER XWÎNÊ DIRÊJE

Xwînmij û cinayetkar qasim Silêmaniyê terorîst û li rastî de baskê şerxwaziya rejîmê û Elî Xamineyî li Rojhilata Navîn de û tevî Ebû Mehdî Muhendis serkirdê Heşda Şeibî, ku şeva 2 li ser 3 a Kanûna duyem a sala 2020 an, li Balafirxana Bexdayê kevtne be êrîşa Amerîka û hatne kuştin, gelek kes û aliyekê û xelkê welatên herêmê li ser vê baverê bûn ku renge bi nemana cinayetkar û terorîstî wiha heya qasekê aramî rû li herêmê bike.




Lê di rastî de tovê şerxwazî û teror û tevdanî û xwînmijiyê ji îdolojî û bingeha rejîma terorîstperwer ve çavkanî digre û Qasisim Silêmanî tenê cîbicîkerê ferman û emrê rejîmê û Xamineyî bû, lewra ez baverim ger sedan terorîst û cinayetkarên dinêye rejîmê jî ji nav biçin, heta ev sîstema terorîstperwer û şerxwaz mabe, çi ji meselê nayête guherîn.

Raste renge cudahiya kesan bandora xwe hebe ku bê guman Qasim Silêmanî renge ji terorîstên dinêye rejîmê baştir li xwînmijî, kuştar, kavilkarî, cinayet û xweşkirina agirê şer û fitnê de hinde qal bibû ku renge bo rejîma terorîstperwere Komara Îslamî re sanahî nebe ku bikare zû dews û rolê wî tejî bike.

**Ev terorîstê navnetewî, destê wî heta enîşkê bi xwîna xelkê Îraq, Sûriye, Lubnan, Felestîn, Yemen, efxanistan û gelek welatên dinê de sor bibû. Ev sebebkarê,kuştina Sedan Hezar kes ji xelkê sivîle Sûriyê û di nava wan de jî sebebkarê kuştara dehan Hezar jin û zarokê kurd li Rojavayê kurdistanê bû û hemî sûriye kavil kir tenê bo xweşkirina agirê şer û aloziyan û dûrbela mana rejîma îranê.**

Qasim Silêmaniyê terorîst bi armanca tolhildana şerê 8 saleye digel Îraqê ji Sunnî mezhebên Îraqê, bi hevdestî digel milîsên girêdayî bi xwe, pîlanrêjî kirin bo çêkirin û ji dayîk bûna girûpekî hov û terorîst bi navê Daîş, û bi çek û cebirxana dewlet û Artêşa îraqê teyar kirin û kirne hêcet ji bona kuştara xelkê Sunnî yên îraqê û kavilkirina hemî bingeh û jêrxana nawçên Sunniyan, ku renge heya 50 salên din ev herêm weke xwe lê neyê.

Qasim Silêmaniyê terorîst ku sondxwariyê xwîn û serê gelê Kurd bû, çi pîlan û fitneyek nema ku neke, tenê bo evê ku Kurd li Herêma Kurdistana Îraqê nebe xwedî serwerî û dewle, mesela sernekevtina refrandomê renge gelek sedemên xwe hebin, lê li rastî de sebebkarê serekî û yekem ku nehêla Kurd bibe dewle, hêz û aliyên Kurd bi dijî hevdu bikar anîn û netebayî xiste nava mala kurdan, ev êrîş û kuştara ku li Kerkukê û nawçên dinê de qewimîn ku bi tangan li ser termê pêşmerge re derbas dibûn, û fermandehiya şerê bi dijî Kurdan, hemî xudî pastarê terorîst Qasim Silêmanî bû.

Her ev rolê cinayetkaraneye wî terorîstî bû ku dema hate kuştin, bi hezaran dayîk û bavên kezeb şewitiye Sûriye û Lubnan û îraq û kurdistanê, keyfxweşiya xwe nêşan dan.

Nehsitî û bîyomiya wî cinayetkarî li astekê de ye ku piştî nemana wî jî bi pîlangêriya Xamineyî û rejîmê, niha jî dibe sebebkarê rijandina xwînê.

Rejîmê di cihê evê ku tola kuştina wî xwînmijî ji Amerîka bistîne, bi mûşekan Firoka misafirî li esmanê tehranê xiste xwarê ku pitir ji 170 kesên sivîl û bê guneh hatne kuştin.

Her li merasima xaksipariya wî terorîstî de ku rejîmê cehd dikir qerebalix nîşan bide, pitir ji 50 kesî li nava aloziyan de canê xwe ji dest da.

Îsal li 4 emîn salvegera kuştina wî terorîstê navdewletî de, bi sedema 2 teqînan li nava merasimê li bajarê kirmanê, 105 kes hatne kuştin û sedan kesên din birîndar bûn.

Ya cihê pirsyarê eve ku gelo çima malbata qasim Silêmanî hebxwe di wê merasimê de nebûne?

Çima çi deshilatdarekî rejîmê û fermandeyekî sipahê û axundek li wan teqînan de nehatine kuştin? Bê guman eva dide xuya ku ev şika xelkê raste ku rejîmê bo bazargermiyê û xapandina raya giştî û cîbicîkirina pîlanên xwe yên qirêj ev teqîn kiribin.

# Tenêtiya dîktatorek



**N.Kerîm Perwîzî**



Kesên ku bi saln li ser kursiyê desthiltdariyê dimînin, bi awayekî narewa dagîrkerên kursiyê desthilatê ne, digel du diyardeyên kawilker bo deshilata xwe rûberû dibin:
Yekem, baweriya wan bi ti kesê namîne û hemû kes wek metirsî an wek moreyek li ser xwe dibînine û tevê vê yekê jî nigeran in wehma kesayetiya wan li cem morên wan bê şikestin lewma dilkuteya vê yekê hene ku li cem wan moreyan jî xoşewîstiya wan nemîne.

Duyem, diyaredeke din pêsîra wan digre ku her li peywendî digel wehma kesayetiya wan ve heye û ew jî ev e ku li bihora salaên li pey hev de, ew soz û dirûşmên ku dane, negihîştine encamê û sal bi sal divê hêcetek bi wan sozên ku negihîştine encamê peyda bikin, lewma sal bi sal dirûşmên mezintir û sozên mezintir û berfirehtir ji berê didin da ku sozên pêştir perdepoş bikin! Nigeran in ku tilisma derevên wan bişkê û wehma kesayetiya wan biherife, şev û roj bo wan tal dike û lipey sozên din digerin da ku heta heyamekê pê derbas bikin.

Weliyê Feqîh ê desthilatdarê welatê belalêdayî ye Îranê, ew dîktatore ye ku li dawî demên temenê xwe de, zêdetir ji heçî demê, seh bi tenêtî û bi dûrmanê dike û rastî tirseke mezin hatiye.
Li wan rojên derbasbûyî de, "Elî Xamineyî" li hevdîtin digel malbata "Qasim Silêmanî" yê terorîst de axaftinek kir ku media û kesên siyasî jê ecêbgirtî man, ew jî ew gotina bû ku got salên berê Xwedê bi zimanê wî axiviye.

Êdî fermandehiya terorîstan û îmametiya wehmî û hêviyên tarî ji Potîn û Hesen Nesrûllah û Hemas û … ti yek hewara wî de nehatin çi derfetek jêre nemaye û ti û xwe kiriye bi zimanê rasterast ê Xwdê bo xelkê! Berê digotin ku welîyê fqîh ayet û nîşan û nûnerê Xwedê ye, lê niha ji vê yekê derbas bûye û xwe kiriye zinanê derbirîna Xwedê.

Li wir ku pile û payê xwe guheriye û hewara xwe bo wehmekî wiha mezin dibe, rewş û dema vê lêkbidin da ku bizanin ku bo Xamineyî xwe kiriye zimanê halê Xwedê û derevek wiha mezin û rohn dike?
Li sîstema wilayeta Feqîh de ji roja yekem heta îro, binyata xwe li ser qurixkirin û dagîrkirina take kesî ya kursî daniye û lewma her Xumêynî û darûdesteyên wî li yekem rojên deshilata xwe de, dest avêtine jinacbirina wan kesan ku bo serxistina rejîmê digel wan bûn û heta ayetullah û rêberên olî jê teror kirin, Kar gihîşte qonaxekê ku Xumêynê, cihgirê xwe anku "Muntezrî" jî hezif kir.

Ew mîrata bo Xamineyî jî her maye û hemû kes ji desthilatê dûr xistiye û heta "Refsencanî" jî li nav hewza avê de da xendiqandin! Dîktator bo evê k ukes nebe şirîkê deshilat û biryarên wî, Hemû ser riya xwe hezif kirin ku li dawiyê de kesekî nezan û ne xwendevare wek Îbrahîm Reîsî û darûdesteya wî bo maye!

Ew yeka li halekê deya ku sal bi salê jî soz daye ku bereya "Moqawimet" berfirehtir bibe û Îsraîl û amerîka dê ji nav biçin! Desthilata wilayeta Feqîh jî ku bi "Omm-ul Qura" ya Îslamê binav dikir, dê perê xwe bi ser hemê dever û cîhana Îslamê bikêşe.
Ew soz tevî ku negihîştine encamê, belkî aboriya wî kawiltir kir û xelkê welat jê bêzar bûn û bereya "Moqawimet" ku biryar bû Îsraîl û Amerîkayê ji nav bibe, niha li Xezê û Bab-ul Mendeb, Sûriye û Lubnan û Îraqê de li jêr bombebaran û mûşek û dironên Amerîka û Îsraîl de ne, û jî Xamineyî nikare pişta wan bisekine û xwe ji berpirsayetiyê diveqelize.

**Tirs ji mûşekên Amerîka wisa lêkiriye ku bibêje ev agehdarê biryarên bereya Muqawimet nîne! Lê tirsa herifîn a wehma kesayetiya wî aliyê kêm li nav alîgirên wî de roj bi rojê zêdetir dibe û seh bi serşoriyê dike.**

Wê serşoriyê wisa pêsîra wî girtiye ku şiyana peydakirina bersivekê bi malbata Qasim Silêmanî yê terorîst jî nîne! Dem kuştina Qasim Silêmanî de Xamineyî û pasdraên terorîst digotin ku dê tolhildaneke dijvar bistînin, lê tevê ku şiyana ti karekî nebûn, belkî mûçek bi balafireke medenî ya Îranê bi xwe dan!

Li vê dawiyê de jî ku şerê Xezê dest pêkir, ji devê pasdarekê derket û got ew şere bo tolhildana Qasim Silêmanî ye, tevî ku nehiştin şev bi ser de derbas bibe û ew yek red kirin, gotin ku wî pasdarî li xwe tiştên wiha gotine! Çimkî ji mûşekên navkî yên "Şeytanê Mezin" ditirsiyan!

Cihgirê qasim Silêmaniyê terorîst jî li Sûriyê hate kuştin û ji nû de cêhgirê serokekê Hemasê li Lubnanê hate kuştin û çi ji destê Xamineyî nehat bo tolhildanê û her xwe ji berbirsayetiyê veqelêze çimkî navên navkî li kendavê de rêz bûne!

Li rewşeke wiha de ku dîktatorê zordar bi tevahî seha tinêtiyê dike û herifîna wehmiya kesayetiya çewta xwe li ber çavên xwe dibîne, bo dildanînîdan bi malbata Qasim Silêmanî û herwisa alîgirên bê mejiyên xwe, naçare derevek mezintir ji derevên caran bike û li rastiyê de bo dildanîdan bi xwe û perdepoşkirian dilkuteya herifîna wehm û xeyalên xwe, xwe dike zimanê bi gur û tundê Xwedê û dibêje her çi gotiye, ew Xwedê bûye ku bi zimanê min axiviye.
Dixwaze bibêje hekî derev kiriye û soza çewt daye û niha dibê bi serşorane xwe ji berpirsayetiyê vedize, ewa Xwda tawanbar e, çimkî ew gotinên vê demê axiviye, gotinên Xwedê bûn ku bi zimanê wî hatiye gotin!

Dîktatorê bi tenê li dawiya temenê desthiltdariya xwe de ji hemû demekê tirsinoktire û ji hemû demekê metirsîdartir e! renge bo parastina wehma kesayetiya xwe ji herifînê, siyaseteke bigre pêş xwe ku hem xelk gelek zêde bêne kuştin û xisarên zaf bi jiyan û darayîya xelkê bikeve û hem desthilata xwe bêxe nav kevaneka agir de.

# Rêjîma Îranê ewlehiya Rojhilata Navîn têk daye



**N.Azad Kurdî**



Rêjîma Îslamî ya Îranê li ber çavên civaka navdewletî di warên aborî û leşkerî de, hem destverdanê di şerê Rûsiya û Ukraniyayê de dike û hem bi heman awayan jî piştgiriya berfireh dide grupên ser bi vê rêjîmê li Iraq, Sûriye, Yemen, Lubnanê û ewlehiya herêmê têk dide.

Piştgiriyên rêjîma Îranê di warên aborî û leşkerî de bi hevalbendên xwe li herêmê, Rojhilata Navîn digel pirsgirêkên gelek micid berbirû kiriye. Îran bi hevkariyên aborî û leşkerî (lojîstîkî) rêjîma Beşar Esed a Sûriyê, Hosiyên Yemenê, Hemas li Gezeyê, Hizbulah li Lubnanê û Heşdul Şebî û komên ser bi vê li Iraqê diparêze û xurt dike. Ev grûp bi budceya sedan milyon dolarî ya rêjîma Îranê mayîne û xurt bûne.

Armanca rêjîmê ya sereke ji van hevkariyan xwe sepandin e bi ser hêzên navdewletî û herêmî weke lîstikvan û hêzeke bi bandor li Rojhilta Navîn. Bo ragirtina hevbendiyê ligel Rûsiyê, di warê leşkerî û lojîstîkî de hevkariya Rûsiya hevalbenda xwe jî dike. Vê yekê welatên Rojavayî zêde tengav û nigeran kirine. Îran bi bikaranîna wan hêzên tundajo yên Şîe di hêrişan de li dijî rikeberên xwe, dixwaze armancên xwe yên siyasî pêşve bibe. Îran di salê de bi milyar dolaran dide wan grupn bona vê yekê. Îran çekên herî giran û mezin dide wan grupn bona ku bi pêkanîn aloziyan li herêmê, siyasetên xwe pêşve bibe.

Şandina firokeyên dron û çekên giran bo van kom û aliyan û handana wan bona hêrişkirin bo ser Amerîka û Îsraîlê, Rojhilata Navîn biriye qonaxeke nû. Ev yek di demekê de dest pê kir û weke bombekê teqiya, ku bo yekemîn car bi pêşengiya Amerîka, peywendiyên Îsraîlê ligel welatên Erebî hatin asayîkirin û biryar bû berî hêrişa terorîstî ya Hemasê bo ser Îsraîlê li 7ê Octobera 2023'an, Erebistana Seûdî û Îsraîl hevpeymaniyekê ava bikin. Lê rêjîma Îranê bi rêya grûpên kirêgirtî yên xwe hemû pêvajo têk da. Îranê bi siyasetên xwe û bi bikaranîna Hemasê, Geze li ser xelkê wê de da kavilkirin. Ev yek jî encama siyaset û bandora rêjîma Îranê bû.

Herwiha bandora hêz û destverdana rêjîma Îranê li Iraqê di asteke din de ye. Iraq ku berê hêzeke mezin û xwedî bandor û serbixwe bû di Rojhilata Navîn de, niha hemû biryarên girîng û çarenivîssaz ên wî welatî li Tehranê tên dayîn. Mirov dikare bibêje ku rêjîma Îranê bi rêya bandordanîn li ser hêzên Şîe li Iraqê û çêkirina grupên zextê yên çekdar weke Heşdul Şebî, rêveberiya Iraqê girtiye destê xwe. Destverdanên Îranê, Iraq kiriye welateke bê serwerî û hemû pirsensîpên navdewletî derbarê Iraqê binpê kirine.

Çi biryar û siyasetekê bixwaze, dikare bi rêya destverdanên xwe cîbicî bike. Hêrişên berdewam ên grupên nêzîk bi Îranê li Iraqê bo ser binkeyên leşkerî yên Amerîka li Herêma Kurdistanê û cihên din, aqibet Amêrika neçar kir ku heftiya berê hêrişê bike ser wan koman. Şirovekarên siyasî li Rojava li siyasetên rêveberiya Biden derheqî gef û hereşeyên rêjîma Îranê bo ser berjewendiyên Amerîka li Rojhilata Navîn nerazî û nigeran in.

Karnasên siyasî û warên leşkerî li Rojava li ser wê bawerê ne , ne mumkin e hêrişeke terorîstî li ser Îsarîl û hêzên Amerîkî li Rojhilata Navîn bê kirin ku rêjîma Îranê dest tê de nebe û di warên aborî û lojîstîkî de hevkariya wan nekiribe. Hevkarî û beşdarîkirin bi Rûsiya re jî bimîne aliyê din.

Vê yekê helwêst û siyaseta welatên Rojava bi dijî rêjîma Îranê guherandiye.

Bûyerên salên derbasbûyî û yên nû li herêmê nîşan didin ku heta rêjîmê Îranê ya niha li ser kar bimîne, Rojhilata Navîn ewlehî û aştiyê bi xwe ve nabîne. Lewma divê bi micidî li ser nemana vê rêjîmê bername bên danîn û kar bê kirin.



# Gelo Rojhilata Navîn avisê bûyerên nû ye?



N. Elî Munezemî



Pîştî şerê Hemas û Îsraîlê, alozîyên Rojhilata Navîn hîn zêdetir û rewş aloztir bûye.
Li zanistên peywendiyên navdewletî de, neorealîzm dewletan bi lîstikvanê sereke yê meydana sîyaseta navdewletî dihesibîne ku heta wê dema ku sîstemek anarşîstî di navbera dewletan de hebe, ew yê li pey serdestî û ewlehîya xwe de bin. Bo wê armancê jî her dewletek cehdê dike ku şîyanên xwe bi awayekê parve bike ku di xizmeta ewlehî û serdestiya wê de bin.

Rejîma Îranê ku bi sedemê bernameyên xwe yê Etomî rastî embargo û dorpêçên aborî bûye û texmîn tê kirin ku eger rejîm li wan pîlanên xwe berdewam be, dikare bibe hereşe bo ser ewlehî û îstiqrara herêmî û cîhanî. Niha ewan dorpêçan hind zext û givaş xistiye ser rejîmê ku bingeha aborîya wê herifandiye û îdî rejîm ketiye rewşekê de ku hekî gotî ser rengê reş re, tu rengî nagirin. Li ber wê yekê, ewê rejîmê ku her tim xwe wek gefekê bo ser ewlehî û hebûna Îsraîlê daye nasandin, piştî bikaranîna hindek ji taşeronên xwe li Lobnan û Xezê, niha qada şerê xwe berfirehtir kiriye û bi bikaranîna Hûsîyên Yemenê, bûye arîşeyek mezin li ser ewlehîya keştîyan li deryaya Sor û Kanala Sûêzê û ewê yekê jî bandorek mezin a nerênî li ser bazerganî û aborîya dinyayê çê kiriye. Li ber wan kiryaran niha guman tê kirin ku metirsiya pevçûnê li Deryaya Sor di navbera hevalbendên DYA û milîsên Hûsî de heye.

Eger em jî di wê baverîyê de bin ku dewlet wek aktorên rasyonel li qada sîyaseta navnetewî de tew digerin, hingê dibe em wê rastîyê jî bipejirînin ku DYA û hevalbendên wê, wê rastiyê baş dizanin ku kê li pişta Hûsîyan e û ew bi kê hatine qurmîş kirîn û ew alî çawa dixwaze di lîstika hêza jeopolîtîk de şaxê xwe bide ber şaxê dewletên hêz-mezin (Zilhêz). Ew hevrikiya eger piyên Îranê nekêşe bo nava şerê rasterast tewî DYA û hevalbendên wê jî, yê DYA û hevalbendên wê yê wisa li wan taşeronan bixin ku Îran êdî nekare carek din şaxê xwe bide ber şaxê dewletek din. Li ber ku armanca bingehîn ji bo DYA û rola wê di Rojhilata Navîn de, mayîndebûna wê wekî dewletek serwer e.

**Ew gef û hereşeyên Hûsîyan di rastî de asteng kirina gihîştina enerjîyê bo welatên pîşesazî û dijayetî tewî sîstema aborî a lîberal e ku DYA sergerîya wê dike, yan jî rolek mezin di sergerîya wê de hene. Metirsiya pevçûnê hingê zêde dibe ku ewlehiya dewletek zilhêz bi têra xwe tê asteng kirin.**

Welatên Norwêj, Kanada, Behrêyn, DYA, Fransa, Îtalya, Holland û Spanya bo ewlehîya keştiyan di Deryaya Sor de û pêşgirtin li hereşeya Hûsîyan, operasyonek bi nawê "operasyona asayişê" amade kirine û armanca sereke ya wan, bêbandorkirina ewan çek û sîlahaye ku Hûsî bo têkdana asayişa hatûçona keştiyan bikar tînin.

Ewa ku hindî taşeronên Îranê rewşa herêmê aloz bikin, di berjewendiya rejîma Îranê de ye. Li ber ku rejîm cehdê dike ku bala civaka nawnetewî bikşîne ser wan alozîyan û bi xiyalek rihettir bi dû bernameyên etomîyên xwe de be. Rejîma Îranê bi pêştgirêdan bi ewlehiya xwe li rêka çêkirina çekên etomî li ser hesabê mezinbûna aborîyê dixwaze emrê desthilatdarîya xwe zêde bike. Ew yeka jî xêncî wê hindê ku dijî maf û azadîya xelkê bindest li Îranê de ye, ew her wisa dijberê ewlehîya Îsraîl û welatên Rojavayî û îstiqrar û aramîya navçeyên hestyar wek Kanala Sûêz û Deyaya Sor e.

Encam:
Hêrişa Hûsîyan bo ser keştîyan di Deryaya Sor û têkdana ewlehîya Kanala Sûêzê de dide eyan kirin ku Îran bi hêceta desteber kirina ewlehîya xwe hazir e ewlehîya hemû herêmê û cîhanê bêxe tehlûkê û ew yeka jî pêş hemû alîyekê de, hereşeye bo ser welatên pîşesazî, bi xasma DYA û ewlehîya Îsraîlê. Li dema niha de ku hindek welatan operasyona asayişê destpê kirine, lê ew operasyona bo demek kurt dikare çereserîya pirsgirêka wan bike, lê bo demek dirêj dibe hemû dewlet û kesên merivhez li hizra piştevanîya xelkên bindestê Îranê de bin bo ku xelk bikare bi hiloşandina wê rejîmê, xizmeteke mezin bi merivahîyê û bi xasma ewlehîya Rojhilata Navîn bike.



# Bila em mohra Kurdî li tundûtîjiyên li ser jinê nedin





**N.Mojgan Elîpûr**
W. HESEN MUKEREM

Jina Kurd jî weke hemû jinên cîhanê ji bo maf û azadiya xwe xwedî dîrokeke dirêj a têkoşînê ye, cihê erdnîgarî û desthilatdariya dîktatoran neçar kiriye ku di du qadên şer de bi pêş bikevin, Têkoşîna neteweyî û têkoşîna wekheviyê, rewşa ewlekarî û siyasî, xebata di warê wekheviyê de kêmreng bûye.

Tişta ku di vê mijarê de hatiye zelalkirin, aliyê yekgirtinê ye, ku nêrîna me li ser pirsê, çareserî û mekanîzman diguherîne û dikare bibe curek tevlîbûna nav têkoşîna neteweyî û bibe alîkarek baş ji bo rûbirûbûna li hember dagîrkeran.

Ji ber ku rejîma serdest li Kurdistanê hertim hewl daye ku pirsa wekheviyê zêdetir bi çand û jiyana Kurdî û ... hwd li Kurdistanê ve girê bide da ku rola xwe ya xirab û wêranker di wî warî de veşêre.

Cudakirina zayenda civakî mijareke girîng di Îranê de ye û ji dema desthilatdariya Komara Îslamî ya Îranê ve hatiye qanûnîkirin, binpêkarî û tundûtîjiya li dijî jinê nekû lêpirsîn jê nayêkirin belkû bihêz û pişt qahîm in bi desthilata li dijî jinê ya Komara Îslamiya Îranê.

Ev pirs ji bo jinên Kurd dijwartir e, ji ber ku dema ew di çarçoveya Îranê de dijîn û di bin van yasayan de ne, mafên wan weke jinên Kurd tên paşguhxistin.

Çimkî rejîma Îranê her ji dema hatina ser kar ve Kurdistan û neteweya Kurd wek gef bo ser desthilata dîktator a xwe dîtiye û ji ber vê yekê jî qasa tepeserî û tundûtîjiyan hertim li Kurdistanê gorî herêmên dinê zêdetir bûye.
Lê, dema ku mijar dibe tundî û tekoşîna li dijî cudahiya zayendî li Îranê, divê em bi hûrgilî wê şîrove bikin û piştre bikevin nava tevgerê.

Her kes dizane ku cudahiya zayendî pirseke cîhanî ye û ne tenê taybet bi Kurdan e, belkû di nav Kurdan de bi sedema têkoşîna hevpar a jin û mêran di warên cuda de, gelek kevneşopî û bandorên xirab ên siyasetên rejîmê ji holê hatine rakirin.

Em di nivîs û şîroveyên xwe de gelek caran civaka Kurd û jin û mêrên Kurd rexne dikin, lê em pêşîneyên vê siyasetê ji bîr dikin, ev jî qada têkoşîna me diguherîne û me ji armanca me dûr dixe.

Em bi bîr bînin ku em di bin desthilatdariyeke dagîrker de dijîn ku bi çêkirina qanûnan li gorî Şerîeta Îslamê jin sînûrdar kiriye û bi salan e ku jin ji mafê beşdariya siyasî û mafê nûneratiyên postên bilind bêpar mane, bi dehan mijarên din jî hene, weke hicaba bi zorê, ku ev zêdetirî çar dehsalan bûye sedema rikeberiya di navbera jin û desthilatdaran de.

Ev yasa û tundûtîjî di Îranê de ji aliyê odeyên fikrî yên rejîma Îranê ve tên birêvebirin û bi hemû aliyên rejîmê ve bi awayeke berfireh hatiye kirin ku ev reftar û binpêkirin di civakê de bûne normên asayî li civakê de û di Kurdistanê de jî weke çanda Kurdî binav dike.

Virda ye ku sînûrê di navbera xebatkaran û rejîmê de hestyartir dibe.

Siyaseta ku bi salane rejîmê li ser gelê Kurd, bi taybetî jinan disepîne û vê bi dûrketin û hejariya çandî ve girêdayî ye, ku qada têkoşîna jinê ji rûbirûbûna bi dîktator re vediguhere civakê û bi destnîşankirina mêran re.

Ya ku wek bandorên desthilatdaran li ser perwerde û berfirehî dan bi tundûtîjiya li Kurdistanê tê dîtin, aliyên cuda jî hene û bê guman her roj em dibînin ku mafên jinan ji aliyê mêran ve tê binpêkirin, û nayê haşakirin, xebitîn dî vê pêwendiyê de erkê hemû çalakvanên sivîl û siyasî ye, çi jin û çi mêr.

Lê ev yeka bi vê wateyê nine ku her tişt li stûyê mêrê Kurd de be.

**Rakirina vê nêrînê û jiholêrakirina van asewaran ne karekî hêsan e û tenê bi rakirina vê desthilatê û hatina ser kare hikûmeteke demokratîk çê dibe ku bikare van mafan di yasayan de bi cih bike, û xwedî plan û projeyên demdirêj be, lê nabe pêka geşeya hizirî ya civaka Kurdî û cihgîrbûna van siyasetên qirêj bêxem bin. Di wî milî de çalakvanên medenî û serbixwe karekî baş kirine û rewşenbîrîkirina di wî warî de bûye û li kêlega vê xebata berdewam a van têkoşeran û di pratîkê de xebata hevpar a jin û mêran di qada têkoşînê de kevneşopiyên hatinî sepandin derdixe pêş û çanda kurdî ya resen cihgîr dike û hewceye ku ev hewlên han berdewam û berfirehtir bikin û tenê erka ser milê jinan nezanin.**

Rejîma Îranê ji hişmendiya siyasî û civakî ya gelê Kurd bi taybet jinan ditirse, ji ber ku dizane têkoşîna jinên Kurd tevlî têkoşîna mafên mirovan û nasnameyan e û nikare van ji hev qut bike.

Di wî warî de her çalakiyek birêve diçe, vê bi çaveke ewlehî dibîne û niha wisa lêhatiye ku xebata di warê jinan de jî wek gefê dibîne û tirs ketiye canê vê.

Mînaka vê yekê jî cezayên giran ên çalakvanên mafên medenî ye, di nav wan de xanima Ferîde Weysî, çalakvana jin, ku çendîn caran bi tohmeta “propagandekirina bi dijî rejîmê” bo dezgeha îtla`atî û dadgehê hatiye gazîkirin, ev yeka di halekê de ye ku bixwe ragihandiye ew tenê li sr jin û hişyarbûnê kar dike.

Ku vîdeoyên ku di dadgehê de di vê derheqê de hatine tomarkirin ev wek tohmeteke nû bo şikesta siyaseta rejîmê ji aliyê dadwer Heyderî ve hatiye bi nav kirin.

Helbet rûbirûbûna van polîtîkayan dê bedelên giran bide ku bi hebûna jinan di qada çalakiyê de ev yek bi giranî ji holê radibe.

# Rewşa çalakvanên siyasî û sivîl û girtiyan li Îranê



**N. Hûmen Simko**

Di van dehsalên dawî de, rewşa çalakên siyasî û medenî di Îranê de weke mijareke girîng hatiye baskirin. Di vê gotarê de hewl tê dayîn ku ronîkirina tepeserkirin û girtina çalakvanên wî warî di civaka Îranê de, bandora wê li ser rewşa mafên mirovan, girtina wan û rola civaka cîhanî di piştevanîkirina mafên çalakên siyasî de lêkolîn bike û van kêşeyan destnîşan bike.

### Beşa 1: Çalakvanên siyasî û ronîkirina zordariyê di civaka Îranê de

Di vê beşê de, rol û girîngiya çalakvanên siyasî û medenî di civaka Îranê de û herwiha ronîkirina tepeserkirin û desteserkirina wan li ser agahdarî û ragihandina giştî, di bin krîzê de ye.

Çalakvanên siyasî û medenî di civaka Îranê de roleke serekî di çespandina dînamîkên civakî û siyasî yên wî welatî de dilîzin. Lê tepeserkirin û girtina wan ne tenê bi dijî mafên mirovan di Îranê de ye, belkî diyardeyek e ku bertekên berfireh di civakê de heye.

Tepeserkirina çalakvanên siyasî bûye sedema astengiyên micid di warê ragihandinê de û bandoreke nerênî li peywendiyên navxweyî û derve yên Îranê dike. Astengkirina medya û fîlterkirina înternetê gihandina agahiyên serbixwe û dînamîk ên civakê kêm dike.

Girtina çalakvanên siyasî dikare bandorên nebaş li ser ciwan û civakê bike. Ev dibe ku bêewlehiya ku ji hêla kesan ve tê hîs kirin zêde bike û ji hêla aborî ve jî bibe sedema lawazbûna baweriya gel.



Tepeserkirina çalakvanên siyasî û medenî mafên mirovan li Îranê de dixe ber gefê. Girtina bê belgeyên yasayî yên zelal, girtina ji ber ramanên siyasî û îşkencekirin qedexeyên ku bandoreke nerênî dadinê ser mafên mirovan.

**Civaka cîhanî roleke girîng di berteka li hember tepeserkirina çalakvanên siyasî li Îranê dilîze. Zêdebûna givaş û rexneyên rêxistinên navdewletî û çalakvanên mafên mirovan dikare lezê bide başkirina rewşa mafên mirovan di wî warî de.**

Tepeserkirina çalakvanên siyasî û medenî di civaka Îranê de bûye sedema diyardeyên berbelav ku ji aliyên civakî, aborî û yasayî de bi bandor in.

Têgihîştina bi hûrî ya van berteknîşandana û bandorên li ser civakê dikare bibe sedema baştir têgihiştina dijwarî û îmkanên heyî û ji bo baştirkirina rewşa mafên mirovan di wî warî de bibe alîkar.

Tepeserkirin û girtina çalakvanan di salên dawî de Ev beş bi vekolîna dosyayên vê dawiyê yên tepeserkirin û girtina çalakvanên siyasî û sivîl di Îranê de hatiye veqetandin û sedem û encamên van siyasetan analîz dike.

Bandora girtiyên siyasî li ser saziyên mafên mirovan Bandora hebûna girtiyên siyasî li ser rewşa mafên mirovan li welat tê nîqaşkirin û çawa bandorê li dînamîkên civakî û mafên kesan dike.

Rola civaka navdewletî û çalakiyên navdewletî di piştevanîkirina mafên çalakên siyasî li Îranê Di vê beşê de, rola sazî û çalakvanên navnetewî di piştevanîkirina ji mafên çalakên siyasî yên Îranê û bandora wê li ser siyaset û biryarên navxweyî tê lêkolîn kirin.

Di encamê de rewşa çalakvanên siyasî û medenî û girtiyan di Îranê de gelek pirs û îmkanan bi xwe re tîne. Vekolîna bi hûrî ya van pirsan ne tenê alîkariya baştir têgihîştina rewşa niha dike, belkî dibe alîkar bo dîtina çareseriyên guncaw û baştirkirina rewşa mafên mirovan di vî warî de.




## Nerîna Lîderan




**“John Bolton”:**

“John Bolton: Êrişên berdewam yên grûpan dê bibe metirsî li parça Herêma Kurdistanê”



**“Mihemed Şyû`î El-Sudanî”:**

“Mihemed Şyû`î El-Sudanî : Dewlet di hewla avakirin komîteyek ji bo bidawîkirina hebûna leşkerî ya hevpeymaniya bi serokatiya Amerîkayê li Îraqê ye”



**“Richard Goldberg” :**

“Richard Goldberg: Teqînên Kirmanê metirsiyeke ewlekariya navxweyî ye û ti pêwendiya wê bi Îsraîl û Amerîkayê re nîne”



“Abram Paley”:

“Abram Paley: “Em gefa hevkarîya çekan ya Îranê bi Hûsîyan û Rûsyayê re cidî dibînin”

## Rêjîmê Şikefta Seholan paşguh xistiye



**N. Eskender Ceiferî**



Di salên dawiyê de, cihên dîrokî, kevnar û torîstî li Kurdistanê zêdetir ji berê têne piştguhxistin. Yek ji wan jî şikefta Seholabê ye.

Şikefta Seholanê dikeve 35 kîlometriya riya di navbera Mehabad-Bokanê de.

Mixabin ti caran rêjîma dagirkar a faşîstên Tehranê wek pêwîst guh nedaye vê şikeftê.

Di salên dawiyê de jî piştî hatina Corona, şerê Ukraynê û niha jî rewşa aloz ya navxwe, ev şikeft ji lîsta cihên torîstî yên Îranê hatiye derxitsin.

Çalakvanan hewl dan wê şikeftê careke din vegerînin nav lîsteyê, lê hewla wan bi ser neket û ji aliyê berpirsên rêjîmê ve nehat pejirandin.

Her hemû torîst û serdanker jî, eger bi dehan caran serdana Seholanê bikin dîsa jî têr nabin. Matmayî dibin û li derdoran dinêrin. Her sal hezaran kes serdana wê şikeftê dikin.

Seholan bi Soranî tê wateya cemedê. Dîwarên wê tev ji kevirên mîna bûzê ne.

Erdê şikefta Seholan ji gelek kaniyên biçûk û mezin pêk hatiye. Dalan û riyên biçûk û mezin jî di dîwarên şikeftê de hene ku ger bi belemê bikarî derbas bibî yan jî bi avjeniyê, hemû digêjine hev. Kaniya herî dawiyê, bi qasî 50 metran serê xwe daye bin banê şikeftê. Kûrahiya avê di kaniya navîn de digihêje 35 metran. 46 salan beriya niha şandeyeke zanîngeha Aksfordê serdana Seholanê kir û ragihandin ku ew şikeft, ji bêmînaktirîn şikeftên cîhanê ye. Wan di raoorekê de di vê derbarê de matmayîna xwe anîbûn ziman. Sala 1990’an jî hejmareke lokîneran ji bo naskirina zêdetir, serdana Seholana Mehabadê kirin. Wan karîn derî û riyên nû di nav şikeftê de bibînim. Vedîtina wan riyan jî bû sedem ku zêdetir girîngî bi Seholanê bê dayîn. Sala 1996’an ew deriyên kevirîn hatin dîtin û di sala 1999’an de jî şaredariya Mehabadê biryar da hemû deriyan ji bo serdana torîst û serdankeran bikar bîne. Li gora ku saziya çandî ya şaredariya wî bajarî dibêje, her sal herî kêm 200 hezar torîst serdana şikeftê dikin.

Lê pirsgirêka Seholanê, ne tenê ev e ku tê piştguhxistin, lê belê ji ber ku rêjîmê hin kelûpel bi simîta pêşesaziyê li wir çê kirine, hinek ji kaniyên wêm şikeftê jî ziha bûne.

Şikefta Seholanê gelek dişubhe şikefta Elîsedr li Hemedanê. Cudahiyeke herî berçav di navbera wan du şikeftan de heye ew jî ev e ku qendîk angu kevirên bûzê tevahiya derdora dîwaran û banê şikeftê di nav de nixumandiye. Ger pêçandina şikeftê bi bûzê nebûya, nava şikeftê ewqasî sar nedibû. Lê ev di demekê de ye ku heya niha tevahiya cihên şikefta Seholanê nehatine dîtin.

Piştî ku mirov derbasî nav şikeftê dibe û riyeke kin bi piyan derbas dike, pişt re bi beleman dikare di ser avê re derbasî nav riyên cuda yên şikeftê bibe. Ji wan keviran, mînakên ku dişubhin ajalan çê bûne. Piyê fîl, bûka deryayê û kevokên xweşik ji wan keviran xuya ne. Weke ku mirov wan keviran bi destên xwe çê bike, bedewî têde reng vedide. Di dîwarên şikeftê de ji xeynî nexş û nîgarên ajalan, hin nexş û nîgarên efsaneyî jî hene.


Kevokên taybet û perçemk angu şevşevok, take rûniştvanên şikeftê ne. Ew nolê mişkan in, lê perên wan hene û dikanin bifirin. Dema mirov bi beleman derbas dibe, ronahiya derdorê nahêle perçemk li wir bimînin ji ber ku ew ji ronahiyê hez nakin û berên xwevdidin dalanên tarîtir. Ew di dalanan de ki ser hêkên xwe dirûnin. Lê kevokên xweşik jî di şikeftê de hene ku berdewam tên û diçin.

Riya dervey şikeftê jî, ji bandora enerjiya nava şikeftê bêpar nemaye. Li gora yasayên Niyoton û fîzîkê, otombêl divê bi dijwarî bikarîn herin ser çiya. Lê li Seholanê ne fîzîk naskirî ye ne jî Niyoton. Ji ber ku otombêl bi hêsanî serdikeve û bi dijwarî vedigere quntara çiya. Çiya jî dikeve ser riya Burhanê ku weke navçeyeke xwediya xwezayek xweşik naskirî ye.

Çalakvan dibêjin eger rêjîm girîngiyê bide vê şikeftê û baş li ser dahata wê plan bike ku ji torîstan tê standin bê guman wê bajarên Mehabd û Bokanê jî avedaniyê bi xwe ve bibînin. Lê belê li wir, ji ber diziyê, ti berpirsekî rejîmê haya wî/wê ji Seholanê nîn e.

Ev çend sal in ku saziya Jîngeyê ya dewletê li parêzgeha Ormiyê biryara parastina navçeyê daye. Lê li gor pêwîstiyê girîngî bi wir nehatuye dayîn. Bûdce jî ji aliyê wezareta navxwe ve radestî qayinqametiya Mehabadê û saziya Jînge hatiye kirin lê ji ber sedemên nediyar ji bo vî karî nehatiye xerckirin.

Tevî vê çalakvanên Mehabadî dibêjin diviyabû pereyên ku ji torîstan têne standin, ji bo avedankirina navçeyê û pişxistinê bihata xerckirin. Lê ew jî xuya nîn e diçe kuderê!



# Tirkiye û siyaseta qirkirina Gelê kurd



**N. Ebdulezîz Qasim**



Dibe ku demkî be jî, lê wisa dixuye ku rêya êrîşên bejayî li pêş Tirkiyê hatiye girtin, piştî dagîrkirina Efrîn, Cerablis, Girê Spî û Serêkaniyê

ku niha dewleta Tirkiyê hewl dide bi rêya êrîşên esmanî û bombebarankirina jêrxana aborî û dezgehên xizmetgozariyê û sivîlan heman siyaseta xwe ya dijî gelê kurd li Rojavayê kurdistanê cîbicî bike, bi pêkanîna êrîşên bi firoke û droneyên, ku niha bi awayekî rojane û bi dijwarî heman êrîşên hovane li dijî Rojavayê Kurdistanê têne pêkanîn

û bi taybetî li ser dezgehên ximetgozariyê û kargehên neft û gazê û dezgehên sivîl têne armanckirin, bi armanca koçberkirina gelê kurd û kavilkirina gund û bajarên kurdan.

Wekî em dibînin ku tawan û komkujiyên mezin ji aliyê Tirkiyê li ser qada Sûriyê û bi taybetî li ser Rojavayê kurdistanê têne pêkanîn

bê hebûna ti reaksiyonên navdewletî bi taybetî ji aliyê Amerîkayê ve ya ku HSD wekî hevalbenda xwe bi dijî terorê de dibîne, herwiha ku bê hîç reaksiyonek ji aliyê rêjîma Sûriyê û hevalbenda wê Moskow ve hebe

ku niha Moskow jî bêdeng maye li hember zêdegaviyên Tirkiyê û çeteyên wê, hevdem ku heta ji aliyê HSD ve hîç rêşûn û rêkarên pêwîst yên siyasî û diplomat nayên standin li hember van destdirêjî û zêdegaviyên hovane

û herwiha ku gelek caran ev êrîşên hovane ji aliyên siyasî û hizbî yên kurdî ve jî nayên şermezar kirin, lewra dikarin bêjin:

**ku hîç reayksiyonên navdewletî û herêmî û heta navxweyî jî bi awayekî rasteqîn li hember êrîş û tawan û komkujiyên Tirkiyê nayên standin, û bi vê yekê ji hemû aliyan ve ku rijandina xwîna gelê kurd li ser destê faşîzma Tirkiyê hatiye helal kirin!.**

Hevdem ku ji aliyê Gelê kurd yê herçar aliyên Kurdistanê bakûr, başûr, rojhilat heta Kafqasiya, herwiha hata bigihe Revenda kurdî ya li dereveyî welat jî, ku hîç karvedan û reaksiyonek bo şermzarkirina neheqiya li ser gelê kurd yê Rojavayê Kurdistanê nayê dîtin!

Ku ev yek nîşana wê yekê ye, ku ew hestê neteweyî yê berê li hember bûyer û rûdanên kurdistanê dihat dîtin, ku îro li hember Rojavayê Kurdistanê nayê dîtin û hestê neteweyî gelek kêm û lawaz bûye?!

Helbet ku Tirkiyê dê berdewam be li ser heman êrîş û komkujiyên rojane

bi taybetî ku hîç karvedanek navdewletî û herêmî û navxweyî nayê standin, hevdem ku Tirkiyê wkî rastiyeke dîrokî ku hebûna xwe li ser qirkirina gelê kurd û dagîrkirina kurdistanê ava dike

**lewra îro divê gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê bihête parastin û derbarê vê rewşa xirab de, dikarin bêjin ku bi taybetî ji Rêveberiya Xweser tê xwestin, ku rê bigire li hember pêkanîna armancên Tirkiyê û yekser divê hîncet û bihaneyan ji dest wê derxe**

ku pêdivî bi hindek rêkarên pêwîst û bilez heye û yekem tişt pêdivî bi bihêzkirina çeperê navxweyî ji aliyê (siyasî, rêveberî, leşkerî, aborî,...) heye

û herwiha ku bi awayekî rasteqîn xwedî li pirsa kurdî wekî pirsek neteweyî derkeve

ji bo bihêzkirina hestê neteweyî li hundir û derveyî welat, ku bi vê yekê ku hemû aliyên siyasî û hizbî û medenî dê xwe bi berpirsyar bibînin li hemberî rewşa xirab ya Rojavayê Kurdistanê



# "Ava" zaroka ku bû goriyê hezkirina dê û bavan



**N.Şîva Xwedabender**
W. HESEN MUKEREM



Çima em gihîştin wira? Kîjan faktor dibin sebeb ku zarok bi hêsanî li gorîgeha malbatê werin darve kirin?

Di wêjeya piraniya ol û baweriyan de, malbat ji bo endamên xwe wekî navendek ewlehiyê tê temisîlkirin, di bin vê stargeha kêmek îstîkrar de, mirov ji her cure metirsiyekê ku li derve rû bi rûiyê wan dibin tên parastin.

Lê, di çend rojên borî de, lêdan û tundûtjiya fizîkî ya li dijî zarokeke temen 4 salî di bin heman stargeh(malbat)a kevin de, pirsên nezelal di hişê min de çêkiriye, gelo bingeha malbatê hejiya ye?

Lawaz bûye? Çi nexweşiyeke bêderman di van rojan de ketiye can û derûna ne ewqas baş malbatê de, ku bi wî rengî, tazî û nepak endama xwe di semenê de difetisîne?

Ya ku di xeyala wî de jê re azadî tê gotin, û em xembar in ji bo malbata bi navê şaristanî, ku hîn di qonaxa xwe ya derbasbûyî de ye, lê bi diyar, ji prensîbên nivîsikî yên têkiliyên malbatê peyrewî dike, di heman demê de ne wisa ye, yên weke "Ava" yê li vê erdnîgariya xembar de ku behsa xizaniyê dikin, ev têkiliyên ku em ji ber wan her roj şîna ji destdana zêdetir a bêbaweriya malbatê û jihevketina navenda germ a ewlehiyê ye.

**Ez di vê baveriyê de me ku çavkaniya van hemû belayên krîzê yên ku pêşîra navenda malbatê girtine û wek metirsiyeke cidî tên dîtin, rewşa kaotîk a aborî ye ku zirarên civakî zêde kiriye, amar diyar dikin ku ji her 100 zewacê 32 zewac bi jehev qutbûnê diqede.**

Ji ber wê ku piraniya zarokên ji hevqut bûnê mafê xwedîtiyê ji bav re heye û ev maf ji dayîkê tê standin, çarenivîsek mîna "Ava" li benda wan e, belkî jî "Ava" herî bextewar be di wê wateyê de ku kameraya hewşa malê perdeya wê sûcê rakir û veşartî nema.

Ji ber vê yekê mirov dikare bibêje ku zirara hevberdanê di rêza yekem de bandorê li zarokan dike û di gava pêş de rasterast malbatê dike armanc û ev yek jî dibe sedem ku paşeroja zarokan têk biçe û heta yên mîna "Ava" yê wan bixe nav destên zirdayîkên hov de.

**Em îro hemû xemgîn û şîna "Ava" temen 4 salî ne, ji ber ku "Ava" ne qurbaniya yekem a bêdilovaniyê bûye, çiqas pir in qurbaniyên ku bi salan in di nav vê malbatê de mirine, hê nehatine veşart in.**



Em xembar û tazîdar in, ji ber ku malbat bi xwe ji hezkirinê, ji aboriya nexweş, ji têkçûna debara jiyanê, ji hev berdanên bêhejmar, ji zarokên encamên ji hev berdanê, ku gelek ji wan çarenivîsa "Ava" yê bendan wan e, ji bêparbûna azadiyê ya ku dayîk û zarokê neçar dike ku bo derveyî sînûran birev in.

# Mandila wek sembol



**N.VÊNÛS FAYÎQ**

W. HESEN MUKEREM

"Tu desthilatek tuneye ku bikare îdaya edaletê bike, ger hikûmet li ser îradeya gel ava nebe. Mandila di sala 1955-1961`an a Zayînî de di Kongreya Gel û Dadgehîkirina îxanetê de got ku ev li vê baweriyê de ye ku piştî beşdariya di nerazîbûnên civîna xwe gihîştan wê qonaxê ku rêgirî bikin li hiloşandina kolana reşpêstan li Sofiyatan û Cohanisbêrgê, û gihîştibû bi wê qina`etê ku tu alitirnatîvek din nin ji bo hêzeke opozisyûn a çekdar

Mandila, ku di nav eşîra xwe de bi navê "Tata an Madîba" dihat naskirin, yek ji wan kesayetiyên cîhanî yên bêmînak e ku zehmet e meriv bi karakterên din ên dîrokê re bide ber hev.

Gotinên wî encama helwest û kirinên wî bûn.

**"Her kes dikare şert û mercan derbas bike, û biserkeve ger dilsoz û dilxwaz be li ser karê ku encam dide"**

" wî got piştî 27 salan di girtîgehê de ji sala 1962`an di merasimekê de bi piraniya dengderan Yek milyar kes li seranserê cîhanê bi ecêbgirtî ve temaşe dikirin û heta 4,000 mêvan beşdar bûn, herwisa piraniya wan serokên para herî zêde ya welatên cîhanê bûn, wî tu carî gelê xwe winda nekir.

Ji wir jî hemû qanûnên cudahikar yên zayendî hilweşandin, bi xizanî û bêedaletiyê re rû bi rû ma û qada xizmetên tendiristî û civakî bê cudahî ji hemû beşên civakê re berfireh kir. Yê ku qet nexwest ji dijminê xwe



re tenazolekê nîşan bide

Lê, wî dixwast ku bi dijminê xwe re bixebite da ku aştiyê ji bo xelkê xwe saz bike: "Ji bo pêkanîna aştiyê divê hûn bi dijminê xwe re bixebitin û wê hingê dijminê we bibe hevkarê we.

Mandila bangeşe bo "rêberiya ji domahiyê ve" dikir, digot "rêberiya ji domahiê ve bike, bila yên din bifikirin ku ew li pêş in", û rêberan dişibînin şivanên ku her dem li pey pezê xwe diçin, cîh ji baştirîniyan re dihêlin ku pêşde biçin û yên din jî bişopînin his bikin ku hûn ji domahiyê ve tên rêber kirin.

Kilînton digot: "Dema ku Nêlson Mandila dihat, me îhsas bi qedir û giraniya xwe dikir, em disekinîn û me pêşvazî jê dikir, ji ber ku me hemûyan dixwest ku em bibin mînakek wek wî ya herî baş." Yanî siyaset ne tenê li ser berjewendiyên aborî, stratîjî û kiryara siyasî ye, belkî bi pêşxistina kesayetiyên takekesî di hemû waran de avakirina civakeke saxlem e.

Ji bo rêberekî ne hêsan e ku vê cudakariyê çê bike ku Mandela pêk anî, cudahiya ku di kûrahiya mejî û nêrînên mirovan de di hemû warên jiyana wan de wek rêberekî bavik çêkiriye, heya îro jî berdewam e, ne hebûn û nebûna wî di jiyanê de.

**Mandila digot, "Tişta ku di jiyanê de girîng e ne tenê rastiya me ye. Lê guhertinên ku me di jiyana kesên din de kirine, jiyana ku me kiriye girîng dike."**



# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Kurdpayê raporeke nû li ser kuştin û birîndarbûna kolberan belav kir

Rêkxirava Mafê Mirovî ya "Kurdpa"yê li raporeke nû de amara kuştin û birîndarkirina kolberan ji sala 2012 heta 2023 belav kir ku li serhev 2 hezar û 206 kolber in.

Pêka rapora nû ya Rêkxirava Mafê Mirovî ya "Kurdpa"yê, li heyama 12 salan anku ji sala 2012 heta 2023 a Zayînî, 589 kolber ji aliyê rejîma Îranê ve hatine kuştin û hezar û 617 kolber jî bi awayên cuda ji aliyê rejîmê ve hatine birîndarkirin ku li serhev 2 hezar û 206 kolber in.

Pêka vê amarê, %73 a kuştin û birîndarkirina kolberan ji aliyê rejîmê bi teqeya rastersat bûye û %6 bi sedema kevtina ji bilindahî, %4 bi sedema sir û seqem û reniyê, %4 bi sedema teqîna mîn bûye.

Herwisa li vê amarê de hatiye ku 40 kolberên ku hatine kuştinê temenê wan jêr 18 salî bûye.
Rêkxirava mafê Mirovî ya Kurdpa yê bi çartên cuda amara sal bi sal ya kuştî û birîndarkirina kolberan û hûrgiliyên vê jî belav kirine.



## Amara sala 2023 a kuştin û birûndarkirina xelkê Belûç belav bû

Kempêyna Çalakvanên Belûç bi belavkirina raporekê daye zanîn ku li sala 2023 a Zayînî de, zêdetir ji 749 kes ji xelk Belûç ji aliyê rejîma Îranê ve li parêzgeha Sîstan û Belûçistan û parêzgehên din de hatine kuştin an birîndarkirin.
Pêka rapora Kempêyna Çalakvanên Belûç, li sala 2023 a Zayînî de zêdetir ji 74 hevwelatiyên Belûç bi teqeya rasterast a hêzên leşkerî yên rejîmê hatine kuştin û 24 kes jî hatine birîndarkirin û herwisa 150 hevwelatiyn Belûç ji aliyê kesên nenaskirî ku pitir kesên ser bi rejîmê an bi kirêgirtiyên rejîmê ne, hatine kuştin û zêdetir ji 20 kes jî hatine birîndarkirin.
Herwisa 172 şewatberên Belûç li encama teqeya hêzên leşkerî yên rejîmê û bûyerên hatinûçonê ku bi sedema lipeykevtina hêzên rejîmê qewimîne, hatine kuştin û 42 kes jî birîndar bûne.
Pêka vê amarê 10 hevwelatiyên Belûç bi sedema şaşiyên pizîşkî, 6 kedkar bi sedema nebûna ewlehiya kar, 51 kes bi sedema qewimîna bûyerên cuda û xendiqîn û 3 jin jî bi sedam tundûtijiya malbatî hatine kuştin.
Herwisa li vê raporê de hatiye: "Li sala 2023 a Zayînî de zêdetir ji 177 hevwelatiyên Belûç hatine bidarvekirin, 836 hevwelatiyên Belûç hatine binçavkirin û herwisa bi 5 haletên binçavkirina bi kom hatine tomar kirin ku hejmara binçavkiriyan nehatiye zanîn,
Li vê amarê de hatiye ku zêdetir ji 68 zarok û 7 jin ên Belûç jî ji aliyê rejîma Îranê ve hatine binçavkirin.



## Cîbicîkirina cezayê bidarvekirina 4 girtiyan di girtîgeha Urmiyê de

Sipêdeha roja Înê 8ê Befranbarê, cezayê bidarvekirina çar girtiyên tometbar bi sûçê hevkariya Îtilaat û sîxûrî bi qazancê Îsraîlê, yên bi navên Nesîm Nemazî, Wefa Hinare, Aram Omerî Berdiyanî û Rehman Perhazû li girtîgeha Navendî a Urmiyê hate cîbicîkirin.
Li gorî nûçeya Kurdpayê, termên wan 4 kesan bi malbatên wan re nehatine radestkirin.
Ev 4 girtî, roja Pêncşemî 7ê Befranbarê bi mebesta cîbicîkirina cezayê biser de hatî sepandin, bo odeya take kesî a girtîgeha Urmiyê hatibûne veguhastin.
Piştî veguhastina wan çar girtiyan bo odeya take kesî, ti hevdîtin digel malbatên xwe nebûne.
Di heyama rojên derbasbûyî de Taya 39 a Dîwana bilinda welat, cezayê wan 4 girtiyên xelkê Urmiyê piştrast kir û cezayê bidarvekirina Mensûr Resûlî, tometbarê dinê ye vê dosyê hilwişand.
Mensûr Resûlî jî, li Banemera 1401 an a Rojî, piştî belavbûna girte fîlmekê li navbirî, li jêr navê, lêpêçîna destûpêwendiyên Mûsad, hate girtin.



# Agirî


Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (461)